## Serkeftina fîlmên kurd

Derhênerê kurd Bahman Ghobadî fîlmê xwe yê bi navê ‘Kes Behsa Pisîkên Îranê Nake’ ve di 62’emîn Mîhrîcana Fîlman a Cannesê de 2 xelat bi hev re wergirtin. Her wiha fîlmê kurdî yê bi navê ‘Pisepis Ligel Ba’ di festîvala Cannesê de sê xelat bi hev re wergirtin. Derhênerê fîlmî Şehram Elîdî ye. Bi giştî fîlm qala jiyan û nemanê dike. Fîlm ji aliyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve hatiye fînansekirin... *R - 6*

# Ji Zanayê rexneya ‘zimanê kurdî’

**Leyla Zana beşdarî Şahiya Ziman a li Amedê hatiye lidarxistin bû anî ziman ku kêmasiya ziman kêmasiya siyaseta kurd e û divê siyasetmedarên kurd di her qada jiyanê de bi kurdî biaxivin**



*KURDÎ* Derê bi munasebeta Cejna Zimanê Kurdî li Parka Koşuyoluyê bi beşdariya şaredar Osman Baydemîr, siyasetmedara kurd Leyla Zana û sedan kesî şahiyek li dar xist. Parlamentera DEP'ê ya berê Leyla Zana ku di Şahiya Cejna Zimanê Kurdî de axivî, diyar kir ku îro gel zêde li ziman xwedî dernakeve kêmasiya vê yekê jî ne ya gel ya siyaseta kurd e. Zana ji siyasetmedaran xwest ku di her qada jiyana xwe de bi kurdî biaxivin... *RÛPEL - 6*

## ‘Rezaleta Min û Rozê’

Ji bilî performansa Xatûn û Rizayê Diholbaz divê ev fîlm ji nû ve bê navkirin. Ev fîlm ‘Payîza Min û Rozê’ nîn e. Encax dibe ‘Rezaleta Min û Rozê’. Ligel ku ev fîlm ne fîlmê Heskîfê ye, di heman demê de heqaretê li nirxên kurdan jî dike. Li dewsa ku kil bikin, kor kirine... *Nivîsa Adil ZOZANÎ - R.6*


# Hawar

Rojnameya Rojane

25 Gulan 2009
Duşem
Sal: 1
Hejmar: 20
Buha: 50 Kr



1 Hezîranê
Rojnameya we
Azadiya Welat



Azadiya Welat
‘Heta meha hezîranê divê gav bên avêtin’

li bayiyan e


# ‘Beşek ji dewletê aştiyê asteng dike’

Li ser daxuyanî û axaftinên rayedarên dewletê Ocalan axivî. Ocalan di hevdîtina xwe ya hefteyî de mijar nirxand û got divê Serokomar û hikûmeta AKP'ê gavên demokratîk bavêjin û aşkera kir ku ger gav neyên avêtin dibe ku Gul û AKP bên tasfiyekirin



## Ayna: Tiştên baş çênabin

*Hevseroka DTP'ê Emîna Ayna ku di mitînga, "DTP'ê bêdeng neke çekan bêdeng bike" de axivî, bang li Serokomar Abdullah Gul kir û diyar kir ku 'tiştên baş çênabin'. Ayna bi gotina, "Birêz Gul ku diyaloga dualî çênebe tiştên baş çênabin" bal kişand ser gotinên Gul. Ayna diyar kir ku piştî daxuyaniyên Gul ev mehek e wekî di kadînê de li derziyê digerin ketine pey tiştekî baş...* ***RÛPEL - 6***

### ‘DESTÛRA 1921’Ê ESAS E’

Lîderê PKK’ê Abdullah Ocalan bi parêzerên xwe re hevdîtin pêk anî û der barê çareseriya demokratîk ya pirsgirêka kurd de, nêrînên xwe anîn ziman. Ocalan, got eger pirsgirêk bê çareserkirin, divê Destûra Bingehîn a 1921'an esas bê girtin.

### ‘BILA OZAL JI BÎR NEKIN’

Ocalan, her wiha bang li AKP’ê jî kir û wiha got: “AKP çi dike bila li ber çavên gel bi awayekî aşkera bike û pêşniyarên xwe yên çareseriyê jî diyar bike. Heke naxwazin bibin weke Menderes û Ozal, bila pêşiya siyaseta demokratîk veke.”

### ‘ERGENEKON HÎN HEYE’

Ocalan operasyonên tên lidarxistin jî bi bîr xistin û wiha got: “Beşeke di nav dewletê de van operasyonan li dar dixe. Hin operasyonên di demên dawî de tên lidarxistin ji aliyê beşek di nav dewletê de tên lidarxistin.”... *RÛPEL - 2*

## Ev in kirinên ‘cehşên qehreman’

Dewlet cerdevanan diparêze lê saziyên mafên mirovan jî roj bi roj sûcên cerdevanan qeyd kirin. Saziyên fermî gelek sûcên cerdevan tevli bûne bi îstatîstîkan girtine. Tiştek nehatiye kirin. Li 22 bajaran 47 hezar û 819 cerdevanên demî û li 32 bajaran jî 24 hezar û 88 cehşên dildar hene... *R.3*

## Bîlançoya 40 rojan giran e

Ji 13’ê nîsanê heta 23’yê gulanê, di pêvajoya bêdengkirina çekan de Artêşa Tirk nêzî 20 operasyonên bejayî, 7 êrîşên hewayî, 12 êrîşên bi topan li dijî Hêzên Parastina Gel pêk anîn. Di encama van êrîşan de 22 gerîlayan jiyana xwe ji dest da. Her wiha gelek siyasetmedar girtî ne... *R.4*

## Rapora Zanqirtê guman zêde kirin

**KOMÎSYONA** Mafên Mirovan a Meclîsê ji bo qetlîama Zanqirtê di rapora xwe de bal dikişîne ser gumanên li ser qereqola nêzî gundê Zanqirtê û wiha pê de diçe: "Demeke dirêj rewşa êrîşê nayê tesbîtkirin, paşê jî bi hinceta ewlekariyê çûyîna herêmê tê biderengîxistin, Cîhaza îxbarê ya ‘alo 156’ beriya hefteyekê xira bûye"... *RÛPEL - 3*

## Li Mêrdînê ji bo aştiyê meşa mezin

**DTP’A** Mêrdînê ji bo ku zext û zordariyên li dijî siyaseta kurd tên meşandin protesto bike Meşa Aştiyê li dar xist. Ji navend û navçeyên Mêrdînê zêdetirî 3 hezar kesî beşdarî meşê bûn. Di meşê de hate gotin ku pirsgirêka kurd bi rêbazên şîdetê nayê çareserkirin û hate xwestin ku pêvajoya bêdengkirina çekan baş bê nirxandin... *RÛPEL - 4*



## Baycan li ser gora xwe hate bibîranîn

Endamê Koma Aştiyê Îsmet Baycan ku di 24'ê gulana sala 2003’yan de li Girtîgeha Mûşê ji ber qeyrana dil jiyana xwe ji dest da, di 6'emîn salvegera xwe de hate bibîranîn. Hevalê Baycan yê komê Mehmet Şîrîn Tunç, Serokê TUHAD-FED'ê Mehmet Şahteke, Wekîla Şaredara Bazîdê Aydin Alkan û endamên meclîsa şaredariyê girseyeka mezin çûn malbata Baycan a li Taxa Ahmedê Xanê ziyaret kirin. Girse, piştî ziyareta malbatê ligel malbata Baycan çûn gora Baycan a li Navenda Navçeya Bazîdê ziyaret kirin û ew bi bîr anî.



## Êşa jinan bi 'Sê Rengan' vedibêjin

Koma Şanoya Hêvî ku demekê navber dabû xebatên xwe, ji nû ve dest bi xebatê kir. Koma ku dest bi xebata lîstika 'Sê Reng' kir, di destpêkê de ji nîqaşa civakê derdikeve rê û pirsgirêka jinê û pirsgirêka 'Namûsê' hildide dest. Di beşa yekem de rengê spî 'Jina civaka paqij' tîne ziman. Di beşa duyem de rengê reş 'Şîn û tarîtiyê' tîne ziman. Di vê beşê de bêtir li ser aliyê civakê yê qirêj tê rawestandin. Jina ku hatiye qirêjkirin li ser rengê reş tê vegotin. Di beşa dawî de jî rengê sor ku 'Êrîşa li ser jinê û namûsê' tîne ziman, tê vegotin... *RÛPEL - 7*


www.sivakurd.org

## Ocalan ji bo çareseriya pirsgirêka kurd pêşniyar kir:

# Destûra 1921'ê esas bigirin

**Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan, ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd xwest destûra bingehîn ya 1921'ê esas were girtin. Ocalan got, divê Serokomar û hikûmeta AKP'ê gavên demokratîk bavêjin û diyar kir ku eger ev neyên kirin wê Gul were tasfiyekirin Ocalan da zanîn ku ew dê nexşeya aştiyê dawiya meha Tebaxê aşkere bike**

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan îna bihûrî bi parêzerên xwe re hevdîtinek pêk anî û der barê çareseriya demokratîk a pirsgirêka kurd de, nêrînên xwe anîn ziman. Ocalan, careke din anî ziman ku eger pirsgirêk were çareserkirin, divê destûra bingehîn a 1921'an esas were girtin. Ocalan got, ew ji bilî vê destûrê tu belgeyê nas nake û bal kişand ser aliyê destûrê yê dîrokî û wiha dewam kir: "Destûra Bingehîn a 1921'an ne destûreke cûdaxwaz bû, sînorên Mîsaqê-Milî digirte nava xwe û tê de cûdabûn nebû. Parlamenteriya Kurdistanê û ji bo kurdan Muxtariyet hebû. Destûra Bingehîn a 1921 di çarçoveyeke demokratîk de hatibû amadekirin, belgeya rizgariya hevbeş a gelên kurd û tirk e. Ew destûra bingehîn ya hevpar a gelên kurd û tirk bû."

**'Ji bo demokrasiyê bibin yek'**

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan, bang li kes û derdorên lîberal, muhafazakar û demokratên radîkal kir, ku ji bo aştî û demokrasiyê werin cem hev. Ocalan got, eger ne wisa be ew ê li hember ergenekonê bi ser nekevin.


*Lîderê PKK'ê Ocalan bibîrxist ku di damezrandina komarê de Ataturkî hevkarî bi kurdan re kiriye û soza muxtariyekê ji bo kurdan hatibû dayîn.*

Ocalan bang li serokwezîrê Tirkiyeyê Erdogan jî kir, ku pêşiya siyaseta demokratîk veke. Ocalan, xeleka demokrasiyê bi sê beşan destnîşan kir û wiha got; "Yekemîn muhafazakarên demokrat, hin kesên di nava AKP'ê de. Duyemîn demokratên lîberal; Derdorên Tarafê û gelek rewşenbîr. Sêyemîn jî demokratên radîkal. Ez xwe û DTP jî di vê xetê de dinirxînim. Û çepgirên demokratîk jî ku di vê grûbê de cih digirin ji vê komê dihesibînim. Ango çepê demokrat ê radîkal. Ev bû çend car e ez dibêjim, divê çepên Ergenekonê û ev çepê demokrat ên radîkal divê ji hev werin veqetandin. Beriya niha min pêşniyar kiribû, ku konferansên lêgerînê pêk werin. Mijarên wiha dikarin di konferansan de bi berfirehî werin gotûbêjkirin. Divê rêxistinbûna sîwane temam bibe. Bi kesên tevlî bibin re riya xwe dewam bikin. Jixwe yên ku tevlî nebin ew Ergenekoniyên çep in."

**'Divê siyaseta demokratîk vekin'**

Lîderê PKK'ê Abdulah Ocalan, her wiha bang li AKP'ê jî kir. Ocalan got, eger AKP çi dike bila li ber çavên gel bi awayekî vekirî bike û divê pêşniyarên xwe yên çareseriyê jî diyar bike. Ocalan, careke din bang li serokwezîrê Tirkiyeyê kir û wiha got; "Eger naxwazin bibin weke Menderes û Ozal, bila pêşiya siyaseta demokratîk veke. Ev yek pir girîng e. Weke nimûne, dikarin Îtalyayê ji xwe re bikin mînak. Di vê meseleyê de Îtalya hinek bi ser ket, lê ne bi temamî. Hêj Berluconiyê wan heye. Lê belê, Spanya bêtir demokratîk bû û bêtir pêş de ket. Der barê vekirina pêşiya siyaseta demokratîk de Zapatero bi ser ket."

**'Parastina xweser pêk bînin'**

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan, der barê operasyonên ku bi armanca îmhakirinê tên kirin de jî axivî û girîngiya parastina rewa bi xetên qalind destnîşan kir. Ocalan anî ziman, ku kêzikek jî ji bo parastina xwe li ber xwe dide û got, ev tiştên ku dibêjim ji bo her kesî çi gerîla, çi sivîl, divê her kes û kom li gorî vê yekê tedbîran bigire.

Ocalan her wiha xwest, ku gotina parastina rewa şaş neyê fêmkirin, dema ku ez dibêjim parastina rewa, nayê wê wateyê ku xwe neparêzin, heta divê parastina xwe 40 qat zêdetir tekûz û mîsoger bikin.

Ocalan wiha got: "Her kes dikare parastina xwe bike. Min têgeha parastina xwe ya xweser ji bo vê yekê pêş xist. Min gotibû, divê ker kes û kom, bi taybetî jin divê parastina xwe ya xweser pêş bixin. Heman tişt ji bo DTP'ê jî pêwist e. Divê her kes, bi zanayî û îradeya xwe parastina xwe pêş bixe. Her kes û kom, qada ku lê ye wê parastina xwe bike. Divê ne-jidil bêcidiyet nêzî pêvajoyê nebin. Dikarin bi sedan balafîran bombe bi ser wan de bibarînin. Divê parastina rewa bêkamasî were kirin. Komên li çiya hemû xweser û otonom in. Di wê demê de eger pêwist be paşve vekişe an jî lazim e çi bike, ew ê bi xwe biryarê bide. Lê belê dema ku ez dibêjim bêçalakî, nabêjim ku parastina xwe ya rewa nekin."

**'Li hemberî DTP'iyan bêrûmetî'**

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan, li ser mijara zextên ji bo îfadedayina DTP'iyan ku li ser pir tê gotûbêjkirin jî rawestiya. Ocalan diyar kir, ku ev yek bêhiqûqî û dorgirtinek e û da zanîn ku, "Dixwazin dor li wan bigirin û bifetisînin, dixwazin wan teslîm bigirin. Divê parlamenterên DTP'ê vê rewşê baş binirxînin û neyên lîstokên van derdoran. Eger ji bo îfadedayinê biçûna, dê ew bigirtana û bixistana hepsê. Û ev yek dê biba bêrûmetiyek.

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan operasyonên tên lidarxistin jî bi bîr xist û got, beşeke di nav dewletê de van operasyonan li dar dixe. Li gor nirxandinên Ocalan di mijara operasyonan de di nav artêşê de nêrînên cihê hene û wiha got; "Di nav artêşê de her kes wek hev nafikire, li hin cihan şerên dijwar rûdidin, li hin cihan jî kêm in". Ev vê yekê nîşan dide, yekîneyên herêmî yên di nav artêşê de însiyatîfa xwe bi kar tînin. Dibe ku ev operasyon ji navenda artêşê jî tên lidarxistin". Ocalan anî ziman ku hin operasyonên di demên dawî de tên lidarxistin ji aliyê beşek di nav dewletê de tên lidarxistin.

Ocalan destnîşan kir ku ev karê Ergenekonê ye û got, ev operasyon ji aliyê beşeke xurt ya di nav dewletê de tên lidarxistin. Li gorî nirxandinên Ocalan eger AKP gavên demokratîk neavêje, ew ê tengav bibe, ev beş wê bixwazin AKP'ê tengav bikin. Ocalan destnîşan kir ku tişta ev kes ji welat fêm dikin, siyaset û rant e û got, aboriya van kesan a talan û tekelê heye.

**'Niha dibe ku her tişt bê kirin'**

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan bi bîr xist ku her beşeke Ergenekonê di girtîgehê de be jî zihniyeta wan hîn jî li ser kar e. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin; "Dîroka Ergenekoniyan ya sedsalî heye, dibe ku komîteciya zihniyeta Îttîlat û Terakî di vê demê de jî hin tişt bide kirin. Komkujiya li gundê Zanqirtê û bûyera li Amedê jî ji aliyê vê komîteciya ku dewama Ergenekonê ye pêk hatiye. Ocalan destnîşan kir ku Îttîhat û Terakkî wek karê destpêkê di sala 1908'an Dr. Nazim kuştiye û kuştin û mudaxeleyên heya îro hatine kirin vegotin. Ocalan got, Menderes jî bi Ergenekonciyan dan dardekirin, malbata Ozal û ya Menderes jî bûyerê dizanin, lê belê nikarin bi cesaret bêjin.

**'Ergenekona sivîl: CHP û MHP'**

Di hevdîtina xwe de Ocalan bal kişand ser aliyê sivîl yê Ergenekonê û wiha got; "CHP û MHP baskên sivîl yên Ergenekonê ne. Bahçelî û Baykal rola xwe baş dilîzin. Dîsa sendîka jî di nav vê mijarê de hene, Turk-Îş lingekî vê yê kûr e". Ocalan anî ziman ku Ergenekon li hundir û derveyî welêt hiqûq nas nekiriye û got, di sala 1998'an de ji bo ew bêbandor bikin 26 kes hatin Îtalyayê û heya mudaxeleyî hilbijartinên li Qibrisê jî kirine. Ev kesên ji doza Ergenekonê hatin girtin bi tenê beşek in, guhê deveyê jî nîn in, heta mûyê deveyê jî nîn in. Beşeke mezin ya Ergenekonê hîn li derve ye. Piştî ku plana reşkujiya li dijî Erdogan aşkere bû, li dijî Ergenekonê bi lez û bez operasyon hatin destpêkirin." **STENBOL / ANF**

## 'Aştiyê asteng dikin'

Ocalan, di dewama daxuyaniya xwe de îşaret bi astengiyên her tim li pêşiya aştiyê radiwestin kir. Ocalan weke mînak ji doza li dijî Serokomarê Tirkiyê Abdullah Gul hatiye vekirin, bi darê zorê dane îfadeyê ya parlamenterên DTP'ê, hovîtiya cerdevanan li gundê Zanqirtê kirî û bûyere li Amedê nîşan da.

Ocalan ev bûyer ji weke hewldanên astengkirina eşkerekirina Ergenekonê binav kirin. Li dijî van hewldanên astengkirin, Ocalan got, divê Serok-komar û hikûmeta AKP'ê gavên demokratîk bavêjin û diyar kir ku eger ev neyên kirin wê Gul were tasfiyekirin. Ocalan weha got, "Yan dê Abdullah Gul gavan bavêje û hêza wan kom bike, yanî ew ê Abdullah Gul tasfiye bikin." Ocalan destnîşan kir ku AKP'ê jî di vê pêvajoyê de dikare gavan bavêje û anî ziman ku kesên mîna Bulent Arinc dikarin lezê bidin avêtina gavên demokratîk.

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan, ji ber ku hewl tê dayîn pirsgirêk bêyî muxeteban were çareserkirin nerazîbûn nîşan dan û weha got: "Hin beşên di nava dewletê de dibêjin, eger çareserî bibe jî bila beyî muxeteban pêk were. Ev nêzîkatî ne raste û wê çareseriyê bi xwe re neyîne. Eger weha dewam bike wê demê wê aştî pêk neyê."

## Hasan OZGUNEŞ

### Gelo kurd çi dixwazin?

Ev pirs her tim ji kurdan tê pirskirin. Ê zana, ê nezan dipirse "gelo kurd çi dixwazin"? Bi rastî carnan mirov matmayî dimîne. Tê bê qey ev pirsgirêk ne li Rojhilata navîn ne li Tirkiyê jiyan kiriye, li gêrsteyrekê din ê ezmanî jiyan kirî ye. Em dizanîn gelê Tirkiye ji derveyê politikayê hatiye hiştin. Ji gel re dibe ku ev pirs heta merheleyekê normal bê dîtin. Belê qaşo ên pispor, nivîskar, siyasetmedar, rojnemevan û hewd. jî vê pirsê dikin. Bê guman hinekê wan dizanin, lê belê ên xwe nezan nişandidin. Hinek jî bi rastî jî vî warî de tucarî nexwestîn rastiyê bizanin, bibînin û ji wan re nebû xem jî.

Tê zanîn ku berpirsyarên gelê kurd bi salan e xwestekên wî gelî tînin ziman û ji rayagiştî re, ji cîhanê re bi awayekî zelal dayîn e kifşkirin. Ên dibêjin em nizanîn, an jî me nebihîstî ye ew niyeta wan xirab e. Belê heta ku em bi wan didin fêmkirin em ê ji wan re bêjîn.

DTP'ê pirtukek ser navê "Projeya Çareseriya Demokratîk ya Pirsgirêka Kurt" bilavkir. Divê pirtukê de xwestekên kurdan bi kurtahî hatiye rêzkirin:

**1.** Di serî de divê çek dualî bên rawestandin.

**2.** Riya guftûgoyan û hevdîtinê bê vekirin.

**3.** Ji bo ku hemû derdor bi awayekê azad bikaribe nêrînên xwe îfade bike derfet bêne afrandin.

**4.** Divê ji bo ku komar demokratîk bibe "Destura Bingehîn" bê guhertin û tê de ev xala hanê bê nivîsandin: "Destura Bingehîn ya Komara Tirkiyê" qebul dike ku hemû çand bi awayekê azad hebûna xwe îfade bike û ji bo pêşvebirina wan dewlet dê alîkariya erênî bide.

**5.** Wateya "Hemwelatîbûnê û Netewbûnê" divê ne bi navê nijada gelekî be, divê ji nû ve bi awayekê hemdem bê şîrovekirin û di "Destura Bingehîn de" bê nivîsandin.

**6.** Zimanê fermî bila tirkî be, belê hemû ziman gorî rewşê divê bibin zimanê perwerdê, di siyasetê û saziyên dewletê de bikaribin xwe îfade bikin.

**7.** Hemû gel bikaribin bi navê netewa xwe û bi zimanê xwe siyasetê bikin, partî û saziyên xwe avabikin.

**8.** Divê îfadekirina raman û rêxistinkirina wî azad be.( Divê xala 6,7,8 jî di Destura Bingehîn de bêne misogerkirin.)

**9.** Divê benda hilbijartinê bê rakirin an jî bê hedek maqûl.

**10.** Divê li Tirkiyeyê 20-25 herêmên " Xweseriya Demokratîk" bê avakirin. Zimanê tirkî û ala tirkan dê li tevahiya Tirkiyeyê be, lê belê her herêm jî dê bibe xediyê meclisa xwe û rengên xwe. Karên rêveberiyê dê navbera herêm û navendê de bi zagonan bê parvekirin.

**11.** Navbera jin û mêran de divê wekhevî di Destura Bingehîn de bê qebûlkirin û alîkariya jinan ji aliyê erênî ve bê misogerkirin.

**12.** Hemû aliyên şer divê hev du efû bikin û qanûnekê ji bo tevlibûna civaka demokratîk bê derxistin û girtî bên berdan. Kuştiyên veşartî bên zelalkirin.

**13.** Gundiyên hatîne mişextîkirin vegerin gundê xwe û hemû cureyên alîkariyê divê bi wan re bê kirin û di mercên jiyanê de bê pêkanîn. Zerar û ziyana wan bê dayîn.

**14.** Di serî de herêma kurdan û hemû herêmên bi salan ji hêla aborî ve hatîn paşve hiştin divê ji bo pêşvebirina wan alîkarî bê kirin.

**15.** Rêxistina Cerdevanî bê rakirin û kar ji wan re bê dîtin.

Wekî tê dîtin daxwazên kurdan gelek daxwazên maqûl in. Dewletbûn, federasyon û guhertina sînoran nayê xwestin. Tiştê dewleta Tirkiyeyê û gelê tirk pê bi êşe tune ye. Daxwazên kurdan gerdunî ne. Rewş ji bo çareseriyê xweş e. Mercên herêmê û navnetewî jî çareseriyê re musaîd e. Tenê xwestin û wêregî pêdivî ye. Divê rayedarên Tirkiyeyê, aştîxwaz, azadîxwaz û mirovhez vê derfetê ji dest dernexin. Dem dema aştiyê ye. Hemû kes dest bavêjin vî barî...

## 'Dê kurd biryara xwe bidin'

LÎDERÊ PKK'ê Abdullah Ocalan, diyar kir ku wan heta niha pêvajoya bêçalakbûyînê pêş xistine û careke din da zanîn ku ew ê dawiya meha Tebaxê nexşeya rê aşkere bike. Ji ber vê yekê Ocalan xwest ku nêrînên, Kongreya Civaka Demokratîk, Amed, rewşenbîr, nivîskar, Talabanî û Barzanî werin girtin. Ocalan anî ziman ku ew ê paşê fikrên xwe pêşkêşî dewletê bike û wiha dewam kir: "Dema ez nexşeya rê amade bikim, ez ê destûra bingehîn ya sala 1921'an esas bigirim. Ez pirs bikim bê ka di nava dewletê de, yên ku heta roja îro li pêşiya çareseriyê bûne asteng kî ne? Kesên monolîtîk, şovenîst û faşîst yên di nava dewletê de heta roja îro li pêşiya çareseriyê bûne asteng. Dema ez van daxuyaniyan didim, ez bi awayekî zelal dibêjim; Ez ji wan kesên ku li pêşiya çareseriyê bûne asteng, hesabê bixwazim. Ez vê yekê li vir bi awayekî zelal dibêjim. Piştî vê nexşeya rê ya ku ez ê aşkere bikim, pêwist e hin gav werin avêtin. Lê eger gav neyên avêtin û çareseriya demokratîk pêş nekeve, wê demê ez ê vê yekê ji kurdan re bibêjim. Ev kes çareseriyê naxwazin. Van kesan heta roja îro pirsgirêk çareser nekirin û ji niha û şûnde jî wê siyasetên xwe yên monolîtîk, şovenîst û faşîst dewam bikin. Ez ê rastiya AKP'ê aşkere bikim".

OCALAN diyar kir ku eger çareserî pêş nekeve, dê kurd biryara xwe bi xwe bidin û wiha axivî: "Der barê tiştê bikin de ew ê biryara xwe bidin. Tê zanîn beriya niha jî min biryar dabû ku ez ê xwe paşde bikişînim, bi sedan hevalên me şehîd ketibûn. Bila tu kes hêviyên wiha ji min neke. Di pêvajoya bêçalakbûyînê de, yên herî baş dizanin ku wê çawa xwe bi cih bikin, ew bi xwe ne."

**HAWAR**
**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.**
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
***Adres:***
Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
***TEL:*** 0 (412) 229 00 30
***Fax:*** 0 (412) 229 00 39

Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstiklal mah. İstiklal. Cad. ***No:*** 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli

www.arsivakurd.org

# Bîlançoya 40 rojan giran e

**NAVENDA NÛÇEYAN** - AMED

Ji 13'ê nîsanê heta 23'yê gulanê, di pêvajoyê bêdengkirina çekan de Artêşa Tirk nêzî 20 operasyonên bejayî, 7 êrîşên hewayî, 12 êrîşên bi topan li hemberî Hêzên Parastina Gel pêk anîn. Di encama van êrîşan de 22 gerîlayan jiyana xwe ji dest da. Her wiha di 14'ê nîsanê de operasyon li hemberî DTP'ê pêk hat. 2 jê cîgirên hevserok, 20 endamên lijneya navendî bi dehan DTP'î hatin girtin.

Koma Civakên Kurdistanê biryara xwe ya ji bo bikarneanîna çekê ya bi mebesta Newroz û hilbijartinên 29'ê adarê, di 13'ê nîsanê de heta 1'ê hezîranê dirêj kir. Rojekê piştî biryara ji bo bêdengkirina çekan operasyona li hemberî DTP'ê hate destpêkirin. Di vê operasyonê de 2 cîgirên hevserokan, 20 endamên lijneya navendî jî di nav de hejmareke mezin a DTP'iyan hatin girtin.

Dema di warê siyasî de siyasetmedarên kurd wisa dibûn hedefa êrîşên dewletê, operasyonên li hemberî hêzên gerîlayan jî bi lezgînî dom kirin. Di navbera 13'ê nîsanê û 23'ê gulanê de 22 gerîlayan di encama êrîşan de jiyana xwe ji dest da. Li gorî qeydên hatine girtin, nêzî 20 operasyonên bejayî li bakurê Kurdistanê, 7 êrîşên hewayî ji bo Bakur û Başûr, 12 êrîşên bi topan dîsa li Bakur û Başûr pêk hatin.

**Kuştin zêde bûn**

Li gorî agahiyên ji aliyê Biryargeha Navendî ya Hêzên Parastina Gel dayîn û nûçeyên ANF'ê di nava vê demê de servîs kirine di 22'ê gulanê de li Licê 4 gerîlayan, di 17'ê gulanê de li herêma Garizan 4 gerîlayan, di 15'ê gulanê de li çiyayê Gabarê 6 gerîlayan, li Dihê du cenazeyên ku dihate îdiakirin ên gerîlayan e rakirin morga Nexweşxaneya Dewletê ya Dihê, di 11'ê gulanê de li Bajargehê 3 gerîlayan, di 30'ê nîsanê de di encama êrîşa hewayî ya dewleta tirk a ji bo Zagrosê li Mawata û Basyayê 2 gerîlayan, di 21'ê nîsanê de li herêma Dêrsimê gerîlayekî jiyana xwe ji dest da. Her wiha di van êrîşan de di 15'ê gulanê de li çiyayê Gabarê 7 leşker û cerdevan hatin kuştin. Li Dihê cerdevanek hate kuştin, 2 leşker û 2 cerdevan birîndar bûn. Di 11'yê nîsanê de jî li Bajargehê 30 pastarên Îranê hatin kuştin. Di 11'ê gulanê de li Çelê leşkerek hate kuştin, yek jê serbaz 3 leşker birîndar bûn. Di 29'ê nîsanê de li Lice-Çewlîkê 9 leşker hatin kuştin. Di 13'ê nîsanê de li Pîranê yêk jê berbaz 10 leşker hatin kuştin. Di 13'ê nîsanê de li Dihê 2 cerdevan hatin kuştin.

**Operasyonên bejayî**

Di 23'ê gulanê de li Gabar û Bestaya Şirnexê, di 21'ê gulanê de li çiyayê Katoyê Elkê, di 15'ê gulanê de li çiyayê Gabarê, li Dihê û li Licê, di 11'yê gulanê de li Çelêya Colemêrgê, Ji 10'ê gulanê heta 17'ê gulanê li Çewlîkê, di 8'ê gulanê de li Gabarê, di 2'ê gulanê de li Besta, di 1'ê gulanê de li Cudî, di 29'ê nîsanê de li Rûbarok, Kelatê û çiyayê Govendê, di 29'ê nîsanê de li Lice-Çewlîkê, di 21'ê nîsanê de li Dêrsimê û li Amedê operasyon, di 13'ê nîsanê de li Amedê, di Pîranê, di 13'ê nîsanê de li Dihê û di 12'ê nîsanê de dîsa li Amedê operasyonên bejayî pêk hatin.

**Êrîşên hewayî**

Di 14'ê gulanê de Zagros, di 8'ê gulanê de Gabar, di 6'ê gulanê de Zap, di 30'ê nîsanê de Mawata, Basya, Gundê Şîvê, Orê, Geliyê Orê, Gundê Reşmê, Gundê Zêrê, Gundê Saca û qontarên çiyayê Karker bi rastî êrîşên hewahî hatin. Di 29'ê nîsanê de geliyê Zapê, gundê fila û gundê Şîvê, di 20'ê nîsanê de gundên Dihokê bûn hedefa êrîşên hewayî yên Artêşa Tirk. Her wiha, Cudî, Zap, Nêrwe, çiyayê Reş, Rûbar, Xakurkê, Partîzan û geliyê Reş, Heftenîn, geliyê Pusaxa, geliyê Asurgê, Fînatê, Kanîreş, Bênavo, Lelîkan û Şêladizê bûn hedefa 12 topabararên di dîrokên curbicur de pêk hatîn.

**Provokasyonên din...**

Di 14'ê nîsanê de li piraniya wan bajarên Kurdistanê li 15 bajaran li hemberî DTP'iyan operasyonan dan destpêkirin. Ev operasyon hê jî didomin. Di 7'ê gulanê de 5 herêm wekî 'herêmên ewlehiyê' hatin îlankirin. di 4'ê gulanê de li gundê Zankirtê 3 jê zarokên hêj di zikê dayikên xwe de 47 kes hatin qetilkirin. Di 5'ê gulanê de li Şîrwana Sêrtê Tîmekî Taybet ê Cerdirmeyan gule li ser yekîneyên leşkerî barandin. Leşkerek hate kuştin. Di 9'ê gulanê de li Kelatê tîmên taybet xwestin li ser navê gerîlayan bi ser yekîneyên xwe de bigirin. Di 10'ê gulanê de li gundê Harana Rûbarokê leşkeran êrîşî gund kir, zarokek birîndar bû. Di 23'ê nîsanê de tîmekî taybet li Colemêrgê bi qontaxa tifingê serê zarokê bi navê Seyfî Turan perçiqand, zarokê bi navê Abdulsamet Erîb dema ji ber polîsan direvî kete çemê Qetremasê û jiyana xwe ji dest da.

## Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna bang li Serokomar Gul kir:

# Tiştên baş çênabin

### DTP'ê piştî Wanê li Stenbolê jî mitîngeke girseyî ya bi mebesta protestokirina êrîşên li ser gelê kurd pêk anî. Ayna diyar kir ku pêvajoyeke xeternak dest pê dike

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna ku di mitînga, "DTP'ê bêdeng neke çekan bêdeng bike" de axivî, bang li Serokomar Abdullah Gul kir û diyar kir ku 'tiştên baş çênabin'. Ayna bi gotina, "Birêz Gul ku diyaloga dualî çênebe tiştên baş çênabin" bal kişand ser gotinên Gul.

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna di mitîngê de axivî û bal kişand ser gotinên Serokomar Abdullah Gul ên wekî, "dê tiştên baş çêbin". Ayna diyar kir ku piştî daxuyaniyên Gul ev meheke wekî di kadînê de li derziyê digerin ketine pey tiştekî baş.

**'Fersenda bêçalakiyê heba nekin'**

Ayna ev tişt gotin: "Hişê xwe bînin serê xwe. Di 99, 2003 û 2006'an de firsetên we heba kirîn cardin, ji dest xwe nekin. 2009'an jî heba nekin. Serokomar Gul dibêje 'dê tiştên baş çêbibin'. Ku dualî nebe tişên baş çênabin birêz Gul. Birêz Gul em dibînin tiştên baş çênabin. Piştî biryara bêçalaktiyê ya KCK'ê ya di 13'ê gulanê de, di 14'ê gulanê de Serokwezîr naaxive lê Serfermandarê Giştî wekî darbeyekê bi saetan diaxive. Em jî temaşe dikin ka dê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd tiştek bêje an na." Ayna, Serokê CHP'ê Baykal jî rexne kir û wiha domand: "Hûn di rewşek dilê mirov bi we dişewite de ne." Ayna gotina Baykal a wekî, "Em pirsgirêka xwe ya terorê çareser bikin" rexne kir û ev tişt gotin: "Birêz Baykal tiştek ez ji we re bêjim tune ye."

**'Bila nasnameya kurdan bê nasîn'**

Ayna bal kişand ser biryara bêçalatiyê ya KCK'ê jî û diyar kir ku di nav 7 rojên pêşiyê de dê biryar bi dawî bibe. Ayna wiha dirêjî da axaftina xwe: "PKK dê bêje min heta 1'ê hezîranê biryara bêçalaktiyê girt, lê hatin ser me û tu gav neavêtin. Dema bêje operasyon nedan rawestandin, em dê çi bêjinê. Du tiştên bên gotin hene. Yekemîn bêçalaktiyê berdewam bike. Em dixwazin vê bêjin lê ji bo gotinê jî divê rûyê mirov hebe. Bila her kes aqilê xwe bîne serê xwe. Bi berdewamkirina operasyonan, kuştin û şer çareseriya aştiyane pêk nayê. Ji bo van hawira aştiyê lazim e. Bi fiîlî be jî lazim e operasyon rawestin. Niha hind kesên nîqaşên çareseriyê dimeşînin behsa mafên keseyî dikin. Ma kurd kesek in ku mafek keseyî hebe. Kurd komek in. Kesek nîn in. Dema kurd tê gotin gelek tê aqilê mirovan. Mafek keseyî yê gelekê nabe, nasnameya gelan heye. Em yek bi yek dibêjin. Ji ber ku fam nakin. Zimanê kurdî heye û ji bo pêşveçûnê divê bibe zimanê perwerdehiyê. Nasnekirina van nasnekirina nasnameya kurd e. 30 sal e dibêjin di mala xwe de biaxivin. Em dê li her derê biaxivin. Çareseriya vê pirsgirêkê karê wêrektî û baweriyê ye. Bi gotina 'dê tiştên baş çêbin' nabe. Em naxwazin 3 salên din winda bikin. Vê mitîngê li ber çavan bigirin û dawiyê li zordariyên li ser DTP'ê bînin." Ayna meşa li Mêrdînê jî silav kir û wiha got: "Em dê di hilbijartinên 2001'an de bendavê ji holê rakin. Di hilbijartinên 2011'an de ev gel dê serkeftin û berxwedana xwe nîşan bide."

**'Ocalan muxatap bigirin'**

Ayna mînaka Mandela jî da û wiha axivî: "Li Başûrê Afrîkayê Mandela muxatap hate girtin û pirsgirêk çareser bû. Li Iraqê Barzanî û Talabanî wekî 'terorîst' dihatin îdiakirin. Lê bi wan re axivîn û pirsgirêk çareser bû. Ku di pirsgirêka kurd de çareseriyê dixwazin lazim e, birêz Ocalan muxatap bigirin. Ji bo çareseriyê divê bi Ocalan re diyalog pêk bê. Bawer bin bi diyalogê rûmeta we naşkê. Tiştek nabe. Hêza rawestandina mirina dê hêza çareseriyê. Hingê dê tiştên baş çêbibin." Ayna navên DTP'iyên hatin girtin xwendin û ew silav kirin. **STENBOL / DÎHA**



## Kê çi got?

**Komîteya Amadekariya Mitîngê Emrullah Bîngol:** Êrîş ne li ser DTP'ê tenê ye, li ser hemû hêzên demokratîk e. Dixwazin bi van êrîşan hêviyê aştiyê belav bikin. Êrîşên li ser DTP'ê mirovan dixe nava tasûwasan. Ji ber ku DTP'ê li Amed, Wan, Êlihê, Îzmîr û Stenbolê serkeftinek bi dest xist rantxur ketin nava tirsê. Ji ber vê tirsê êrîş zêde kirin. Êrîjî jinan, ciwanan, elewî û kurdan dikin. Pûçderxistina van erîşan karê ser milê me ye.

**Serokê DTP'a Stenbolê Halîl Aksoy:** Gel muxatabê kurdan aşkera kiriye. Her kesî dît û dizane ku muxabatê pirsgirêka kurd Ocalan e. PKK ye û DTP ye. PKK, Îmralî rastiya vî welatî ye. Ger ku çareseriyê dixwazin dikarin bi riya DTP'ê û hêzên demokrat pirsgirêkê çareser bikin.

**Ji Platforma Hevgiriya bi DOKH'ê re Nîlgun Yurdalan:** Em ê piştgiriya xwe ya ji bo DTP'ê bidomînin û di 31'ê gulanê de li Amedê em ê mitîngekê pêk tê bibin. Bi armanca serbestberdana endamên DTP'ê dê di 1'ê hezîranê de em ê dest bi kampanyaya îmzeyan bikin.

**Cîgira Hevserokên DTP'ê Sebahat Tuncel:** Kurd tu caran ji ziman û çanda xwe tawîzê nadin. Kurd dixwazin ji bo çareseriyê îradeya wan li ber çavan bên girtin û bê naskirin. Pirsgirêk bi muxataban re tê çareserkirin. Muxatabê pirsgirêkê jî Ocalan e.

**Serokê Giştî yê EMEP'ê Levent Tuncel:** Lazim e karker ji biaxivin. Sendîqayên kedê divê dengê xwe derxin. Divê tevgera karkeran bikeve nav hewildanê. Divê çekên cerdevanan bên hildan û eşûyek siyasî ya bêcudahî bê derxistin. Lazim e bi nûnerên gelê kurd wekî nûnerên xwe hilbijarîn û qebûlkirin re diyalog hebe. Berî niha jî ev biryar hatin girtin lê gav nehat avêtin. Gotina 'dê tiştên baş çê bibin' tenê têrê nake.

**Nûnera Dayikên Aştiyê Sultan Bozkurt:** Destê kurdan ê aştiyê bi salan e li hewa dimîne. Daxwaza me ew e ku Ocalan wekî muxatap bê qebûlkirin.

## Gelek sazî beşdar dibin

Platforma Şaxên KESK'ê ya Stenbolê, Platforma Azadiyên Civakî, SDP, EMEP, ESP, Dev-Genç, Lîseyiyên Têkoşer, Genç-Sol, SODAP, Komeleya Mafên Mirovan û gelek saziyên civakî beşdarî didin mitîngê. Mitîngê bi ketina Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna û parlementerên DTP'ê Hasîp Kaplan, Osman Ozçelîk, Sebahat Tuncel, Bengî Yildiz, Aysel Tugluk, Pervîn Buldan, Serokê Giştî yê KESK'ê Samî Evren, Serokê DTP'a Stenbolê Halîl Aksoy, endamên Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê, Parlementerê ODP'ê Ufuk Uras, Serokê Giştî yê EMEP'ê Levent Tuzel, Oktay Konyar, Şaredarê Êlihê Nejdet Atalay, Şaredarê Îdirê Mehmet Nurî Guneş, Şaredara Bazîdê Canan Korkmaz, gelek şaredarên DTP'î jî beşdarî mitîngê bûn.

## Ji Stenbolê banga çareseriyê

Ji bo mitînga, "DTP'ê bêdeng neke çekan bêdeng bike" deh hezaran kes li Qada Çagliyana hatin cem hev. Piştî meşa hatî li darxistin zêdeyî 30 hezar kesî li qada Çalgilayanê hatin cem hev.

Deh hezaran kesên li qada ji hêla polîsan ve hatiye dorpêçkirin, bi kesk, sor, ser û alên DTP'ê xemilandin. Alên PKK û posterên Rêberê PKK'ê Ocalan hatin vekirin. Li sahneyê pankarta, "DTP'ê bêdeng neke çekan bêdeng bike" hate daliandin. Her wiha pankartên, "Çareserî komara demokrat3ik e", "an aştiyek bi rûmet an jî berxwedanek bêhempa" hatin vekirin. Mitînga DTP'ê piştî axaftinan bi stanan dom kir.

## Ji bo parlamenterên DTP'ê hefteya krîtîk

Ji bo Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk û 4 parlamenteran ku beriya bibin parlamenter doz lê hatine vekirin û didomin, hefteyeke krîtîk dest pê kir. Divê Turk û Wekîlê Serokê Koma DTP'ê Selahattîn Demîrtaş heta roja sêşemê saet 17:00'an îfade bidin.

Piştî dîroka ku ji aliyê dozger ve hatibû diyarkirin di parlamentoyê de hevdîtin zêde bûn û DTP'iyan diyar kir ku îfade nadin. Serokê parlamentoyê Koksal Toptan û Wezîrê Karê Hundir Beşîr Atalay her çiqas gotin ku 'bi zorê îfade nayê girtin' jî tê gotin ku dozgerî dikare bi zora polîsan parlamenteran bibe dadgehê û îfadeya wan bigire.

Turk di mitînga Wanê de anî ziman ku di dîroka Tirkiyeyê de cara yekem e ku parlamenterên ku mafê wan ê destênedanê heye ji bo îfade dayînê tên vexwendin. Turk got ku tu hêzek nikare me bibe zorê dadgehê. **ENQERE**

## Li Mêrdînê 'Meşa Aştiyê'

DTP'a Mêrdînê ji bo ku zext û zordariyên li dijî siyaseta kurd tên meşandin protesto bike Meşa Aştiyê li dar xist. Ji navend û navçeyên Mêrdînê zêdetirî 3 hezar kesî beşdarî meşê bûn. Di meşê de hate gotin ku pirsgirêka kurd bi rêbazên şîdetê nayê çareserkirin û hate xwestin ku pêvajoyê bêdengkirina çekan baş bê nirxandin.

Girseya li ber avahiyê DTP'ê li hev civaya bû heta ber Rawestgeha Texsiyan a Yenîşehîrê meşiyan. Girseya ku meş li dar xist bê navber dirûşma 'Bijî Serok Apo' qêriya. Jin bi cil û bergên xwe yên neteweyî beşdarî meşê bûn û govend hate girtin. Meşa bi şîara 'Nemre û ne kuje' pêk hatî bi axaftina Şaredara DTP'ê ya Nisêbînê Ayşe Gokkan û Serokê DTP'a Mêrdînê Hilmî Oncu bi dawî bû. Gokkan di axaftina xwe de bal kişand ser zext û zora li hemberî gelê kurd tê meşandin û bang kir ku dawî vê van zext û zordariyan bê anîn. Oncu jî di axaftina xwe de bal kişand ser biryara KCK'ê ya ji bo bêçalakbûnê ya ku dê heta 1'ê hezîranê dam bike û bangî rayedarên dewleta tirk kir ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurd gavên şênber bavêjin. **MÊRDÎN**




www.arsivakurd.org



# Têkiliya wêjeya kurdî û mekan

**Îrfan AMÎDA**

Dixwazim tişta divê di dawiya vê nivîsê de bêjim di serî de destnîşan bikim û paşê li ser mînakan rawestim. Tişta ku bêjim ev e: Têkiliya wêjeya kurdî û mekan têkiliyeke qels e. Sedemên vê yekê têkiliya kurdan û mekan e ku ev têkilî jî di nivîsa hefteya borî de min hinekî şîrove kiribû. Ji ber ku di nava kurdan de bi piranî yekmekanî heye û ew mekan jî mekaneke metaforîk e, rola mekan ya sînorkêr û bandora wê ya li ser mirovan zêde li ber çavan nayê girtin. Ji loma jî di wêjeya kurdî de piranî bi awayê metaforîk û hêmayî tê bikaranîn. Ev yek di helbestê de mirov dikare bêje bi gelemperî heye.

Di helbesta kurdî ya nûjen de mekanên têne bikaranîn û şêwaza bikaranînê, ji bilî hin awarteyan, bi giştî di çarçoveya yekmekaniyê de û metaforîk û hêmayî ye. Kurdistan û çar parçebûna wê, gund û valakirin/şewitandina wan, çiya û bajar (Mehabad, Amûdê, Amed, Dêrsim, Helepçe…) ku gişt jî bi rola xwe ya di hişê kurdan de û bi bûyerên li wan qewimîne têne formulekirin. Helbet di helbestê de dê bikaranîna wan metaforîk û hemayî bin lê mayîna di nava wan sînoran de gelekî razber dike.

Belkî tiştê herî balkêş a di vê peywendiyê de jî ew e ku helbestkarên di girtîgehê de û yên gerîla ne jî bi heman refleksan tevdigerin. Ligel ku helbestkarî di nav girtiyên kurd de gelekî bi pêş ketiye û helbestên xurt û hêja têne nivîsîn jî mirov nikare behsa têkiliya vê helbestê û girtîgehê formule bike. Hêma û metaforên ku ji ber wî mekanî hatine afirandin gelekî kêm in. Heman tişt di nava helbestkarên gerîla de jî heye. Mirov nikare helbestkarekî/ê wekî helbestkarê/a çiya ya jî girtîgehê nîşan bide.

Helbet têkiliya helbestê û mekan ne têkiliyeke gelekî zelal a wekî pexşanê û mekan e. Lê di pexşanê de jî têkiliyeke xurt tuneye. Di pexşanê de, çîrok an jî roman, ji bo ku mekan bi hemû taybetiyên xwe bêne bikaranîn divê mekan baş bê naskirin û problemên di navbera mekan û mirov de, ya bêne formulekirin ya jî bêne çareserkirin.

Çawa Orhan Pamuk ji bo romana xwe ya bi navê “Kar” binivîse gelek caran çûbe Qersê û li wir mabe û ji gelek hêlan ve lêkolîn kiribe her wêjevan divê mekanê ku di berhema xwe de dê bi kar bîne divê ji nêz ve bizanibe, bikaribe têkiliya mirov û mekan deşîfre bike.

Ji hêleke din ve jî bandora mekan ya li ser mirov divê bê zanîn lê ev bandora mekan a li ser mirov bi demê ve jî têkildar e. Heger taybetiyên mekan û dem li hev nekin dê bandora mekan ya li ser mirov û bûyeran jî, bi erênî ya jî neyênî, neyê formulekirin. Bi vî awayî jî, gelek caran, teksta wêjeyî dê ji rastiyê bi dûr bikeve û têkiliyeke anakronîk bê afirandin. Heger ne wekî şêwazeke hunerî anakronîzm bi kar hatibe tê wateya ku mekan elementên mekan û yên li wî mekanî dijîn nayê zanîn.

Mînaka herî balkêş a di pexşana kurdî de -ku bi tena serê xwe hêjayî analîzkirinê ye di vê peywendiyê de- “Rojnivîska Spinoza” ya Şener Ozmen e. Mekanê sereke yê di romanê de Kurdistan e û wekî yekmekanî hatiye bikaranîn. Ger çiqasî çar mekanên esasî hebin ji ev çarparçebûna Kurdistanê ye. Di romana Şener Ozmen de “Zex” ne tenê “Zex” bi giştî bakurê Kurdistanê ye. Wekî her sê parçeyên din. Hê di vegera Yasîn de mirov têkiliya “Zex”ê û “Zex”iyan dibîne. Ev yek ji bo parçeyên din û karaktera wan parçeyan jî derbas dibe. Çawa çarparçebûn di mekanê bingehîn de hebe, di heman demê de, ev her çar mekan yekmekaniyê jî dinimîne. Dîsa di heman demê de, ev rastî ji bo lehengên romanê jî derbas dibe. Têkiliya mekan û mirov, qedera mekan û mirov bi hev ve girêdayî ye. Ji hêla bandora mekan a li ser afirandina karaktera mirovan jî hêjayî nirxandinê ye. Lê di vê romanê de jî binavkirina mekan metaforîk e û li gorî hiş û bîra kurdan e, mînîmîzekirin û têkiliyeke normal a bi mekan re nayê dîtin.

Gelek mînakên din ên ku mirov dikare bide hene helbet. Ji hêleke din ve jî di gelek berheman de jî xuyaye ku beriya her tiştî têkiliya wêjevan ya bi mekan û elementên wan mekanan re û bi zemanê mekan re qels e. Dibe ku têkiliya kurdan û mekan têkiliyeke problematîk be û ji ber vê jî zêde neyê mînîmîzekirin û aşkera neyê bikaranîn lê ji derveyî vê jî wekî wêjevan têkiliyeke qels heye bi mekan re û tiştê ku problemê kûrtir dike ev e bi ya min.

HAWARA EYŞO

ROMANTÎZMA SER SÛRÊN DÎROKÎ




TÎTANÎKA KURDÎ




JI PIŞT DÎWARÊN HESINÎ






dilges_dilges@hotmail.com
Dr. DILGEŞ

# Gotar û guhar

Gelî dost û hêjayan! Malûm e, her gotar di heman demê de guharek e. Gotar; yanî tara go(tin)an, gotin dane ber tarê û hûr û kûr hatine jenîn…

Heçî guhar e, xirşek e; ji bo delalî û spehîtiyê, ji bo derxistina pêş a mêyatî û erotiyê dixin guhê kesan.

Di nav xelkê de tê gotin, “Vê gotinê bike guhar û bike guhê xwe da ku tu carî ji bîra te neçe”

Dêmek, gotar û guhar her du ji bo ‘ji bîrê neçin’ li guhê mirovan digihêjin hev.

Gelo ma qey însan bi guhê xwe bîr bi ‘gotinekê’ dibe? An guhar li vê derê wekî ‘hard disk’a gotinên jibîrneçûyî xwedan kargeriyeke cuda ya metafîzîkî ye?

Bila aqilê we şêlo nebe bi vê nirxandinê, her çend têkiliya gotar û guharê ji erdê heta ber perê erşê ezîm (heta galaksiya andromenayê) ji hev dûr be jî, dîsa jî, em ê sînorên mantiqî bişeqînin û bînin gotar û guharî di nivîsarekê de bikin cîranê hev û wekî çawa di efsaneya Memê Alan de efrîd û ferişteyan Memê Alan û Zîna Zêdan di xewnekê de anîn nik hev û her du kirin bengiyê hev, em ê jî wisa bi kotekî gotar û guharê bigihînin hev.

Çend nimûneyên gotar û guharê li xwarê ne:

Her gotareke nêr a dilînî ji bo xwedanguharekê tê nivîsandin.

Her guhareke hêjayî gotarekê ji bo xwedangotarekî dilzîz bi guhî ve tê kirin.

Her gotareke aqilkûr wekî guharekî li hişê mirovî tê bidarvekirin.

Her guharekî guhderz ji bo balkişandina gotarnûsekê tê çêkirin.

Dostên min ên hêja, dibe ku vê gotarê serê we êşandibe û hûn di dilê xwe de bibêjin, “Heyran, madem tiştek tunebû tu binivîsî te nenivîsiba” Gotina we ser şekirê.

Ji ber wê jî, min xwest vê hefteyê di nav Bila li bîra we be ku zimanê kurdî jî wekî ‘şekirê’ ye û loma her gotara bi kurdî guharekî bi tirkî ji guhî vedike.

Ji kerema xwe mail û nameyên xwe rêkin. Têm çavên we; mirçççç :))

# 9’emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Diyarbekirê

27 Gulan Çarşem

*Vekirina Pêşangehan*
**Wêne:** Çend Zeman Bihurîn / **Fevzî Bîlge**
Jin / **Rabîha Arslan**
**Cih:** Mêvanxaneya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 10.00-10.30

**Wêne:** Azadiya Li Paş Dîwaran / **Kemal Zengin - M.Alî Yaşa** / Girtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê Ji Çavên Zarokên Mexmûrî Mexmûr / **Zarokên Mexmûrî**
**Cih:** Galeriya Hunerê - Sumer Park
**Kat:** 10.30-11.00

**Wêne:** Roj / **Haci Çelîk**
**Cih:** Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle-Firatê
**Kat:** 11.30-12.00

**Wêne:** Pêşangeha Wênesazên Hewlêr
**Cih:** Fuara Şaredariya Bajarê Mezin **Kat:** 12.00-13.00

**Fotograf:** Qerejdax / **Umut Kaçar**
**Cih:** Salona Pêşangehê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 13.00-13.30

*Dîwançe*
Ji Bo Biranîna Mamoste Selîm Çevîk Rengê Me û Dengê Me / **Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle Firatê**
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 13:00-15:00

*Şano*
**Kom:** Teatra Perîstan/ Weqfa Çand û Hunerê ya Başak
**Lîstik:** Perîstan
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 17.00–19.00

*Bernameya Danasînê*
**Axaftina Vekirinê:** Parêzer Osman Baydemîr / **Şaredarê Bajarê Mezin a Diyarbekirê**

**Pêşandana Sînevîzyonê / Dîmenên Arşîvê yên Festivalê**
**Dîwançe:** Mehmet Akbaş - Ayfer Duzdaş
**Cih:** Anfî Tiyatro - Sumer Park
**Kat:** 20.00-23.00

28 Gulan Pêncşem

*Panel*
**Mijar:** Jin, Namûs, Azadî
**Beşdar:** Çaglar Demîrel / **Şaredara Dêrikê -** Songul Morsumbul / **Sekretera Jin a KESK’ê -** Parêzer Ayla Akat Ata / **Parlamentera Êlihê ya DTP’ê -** Yard.Doç.Nazan Ustundag / Endama Hîndekariyê ya Zanîngeha Bogazîçiyê
**Moderator:** Yuksel Genç / Rojnamevan - Nivîskar
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 11:00-13:00

*Dîwana Dengbêjan*
Koma Jinên Dengbêj a Botanê
**Cih:** Mala Dengbêjan
**Kat:** 16.00-17.30

*Pêşandana Belgefîlm*
**Belgefîlm:** Girtîgeha Hejmar 5
**Derhêner:** Çayan Demîrel
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Pêşandan:** 16.00–18.30

*Şano*
**Kom:** Şanoya Bajêr a Trabzon
**Lîstik:** Dengê Der
**Cih:** Şanoya Dewletê ya Diyarbekirê
**Kat:** 19.00–21.00

*Meşa Festivalê*
*'Bi Çand û Hunerê Xeyalên Azadiyê Pêk Bînin'*
**Rêgeh:** Deriyê Riha - Deriyê Çiyê
**Kat:** 19:00-20:00
**Konsêra Vekirinê**
Koma Nûjen
Ozlem Ozdîl
Rojda
**Cih:** Qada Deriyê Çiyê
**Kat:** 20:00- 24:00

29 Gulan În

*Şano*
**Kom:** Teatra Arzeba
**Lîstik:** Name
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 14.00–15.30

*Dîwana Dengbêjan*
Dengbêjên Mala Dengbêjan ya Diyarbekirê
**Cih:** Mala Dengbêjan
**Kat:** 14.00-16.00

*Pêşandana Belgefîlm*
**Belgefîlm:** Close Up Kurdistan
**Derhêner:** Yuksel Yavuz
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Pêşandan:** 17.00–19.30

*Şano*
**Kom:** garajistanbul
**Lîstik:** Nûçegihan
**Cih:** Şanoya Dewletê ya Diyarbekirê
**Kat:** 19.00–21.00

*Pêşandana Fîlm*
**Fîlm:** Min Dît
**Derhêner:** Miraz Bêzar
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Pêşandan:** 20.00–22.00

*Dîwançe*
Koma Yekta
Rengîna Mezopotamya / **MKM-Der Edene**
**Cih:** Anfî Tiyatro - Sumer Park
**Kat:** 20.00–23.30

30 Gulan Şemî

*Panel*
**Mijar:** Di Pirsgirêka Kurd de Modela Çareseriya Demokratîk
**Beşdar:** Hatîp Dîcle / **Parlamenterê Kevn ê Depê -** Oral Çalışlar / **Rojnamevan-Nivîskar** Ufuk Uras / **Parlamenterê Stenbolê yê ODP’ê -** Emîne Ayna / **Hevseroka DTP’ê - Parlamentera Mêrdînê**
**Moderator:** Ayhan Bîlgen / **Sekreteryaya Meclîsa Aştiyê**
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 11:00-15:00

*Çalakiyên Zarokan*
**Danîna Qurnefîlan a Zarokan Ji Abîdeya Jiyanê Re**
**Cih:** Parka Koşuyolu
**Kat:** 14.00-15.00

*Şahiya Bafirokan*
**Cih:** Kırklar Dagi
**Kat:** 16.30-18.00

*Pêşandana Dansê*
**Kom:** Civata Dansê ya Mezopotamyayê
**Proje:** Destana Kawayê Hesinkar (Promîer)
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 16.00-18.00

*Pêşandana Fîlm*
**Belgefilm:** Du Ziman Yek Bahol
**Derhêner:** Ozgür Dogan - Orhan Eskîkoy
**Cih:** Mega Center CihneMall
**Pêşandan:** 16.30–18.30

*Meş*
**Rêgeh:** Parkorman- Hemberî Salona Dawetê ya Ava / Dîcle Kent
**Kat:** 18.30-19:30

*Konsêra Girtinê*
Çîroka Rêwitiya Me / **Şahiya Stranan-Hunermendên NÇM’ê**
Koma Muzîkê ya Gose ya Bask
Xemgîn Bîrhat, Peywan Arjîn, Hekîm Sefkan, Zozan / **Hunermendên Akademiya Çand û Hunerê ya Kurd**
Alî Asker
**Cih:** Hemberî Salona Dawetê ya Ava/Dîcle Kent
**Kat:**19.30–00.00

*Atolye*
**Fotograf:**
**Perwerdekar:** Umut Kaçar-M.Sait Taşkıran
**Cih:** Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle - Firatê
**Mêjû:** 19-25 Gulan
**Şano**
**Perwerdekar:** Muhsin Osman - Durukan Ordu
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Mêjû:** 11-25 Gulan
**Cam-Seramîk**
**Perwerdekar:** Firat Erdogan
**Cih:** Sumer Park
**Mêjû:** 19 Gulan

*Sînema*
**Perwerdekar:** Yeşim Ustaoğlu
**Cih:** Salona Sinemayê ya Burhan Karadenîz
**Mêjû:** 23–24 Gulan

*Def*
**Perwerdekar:** Mamoste Şêrko
**Cih:** Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle – Firatê
**Mêjû:** 04-18 Gulan

*Dansên Gelêrî*
**Perwerdekar:** Osman Bozkurt
**Cih:** Sumer Park
**Mêjû:** 10 - 25 Gulan

✓ Beşdariya meşên festîvalê wê bi cil û bergên gelêrî be.
✓ Fîlm-Belgesel û şano wê bi bilêt bin. Bilêt 2 TL ye.
✓ Hûn dikarin bilêtan ji Gerînendehiya Çandê ya Şaredariya Bajarê Mezin û gîşeyên li Kuçeya Hunerê peyda bikin.



www.arsivakurdi.org

# 'Kêmasî ya siyasetmedaran e'

**Bi boneya cejna ziman li Amedê di şahiya ku hate lidarxistin de Leyla Zana anî ziman ku kêmasiya ziman kêmasiya siyaseta kurd e û divê siyasetmedarên kurd di her qada jiyanê de kurdî biaxivin**







Kurdî Derê bi munasebeta Cejna Zimanê Kurdî li Parka Koşuyoluyê bi beşdariya sedan kesî şahiyek li dar xist. Parlamentera DEP'ê ya berê Leyla Zana ku di Şahiya Cejna Zimanê Kurdî de axivî, diyar kir ku îro gel zêde li ziman xwedî dernakeve kêmasiya vê yekê jî ne ya gel ya siyaseta kurd e. Zana ji siyasetmedarên kurd xwest ku di her qada jiyana xwe de bi kurdî biaxivin.

Di şahiya pankarta "An nebêjin em kurd in, an jî bi kurdî biaxivin" hate vekirin de sloganên, "Bêziman jiyan nabe" û "Bijî Serok Apo" hatin berzkirin. Di şahiyê de Serokê Giştî yê Kurdî Derê Remzî Azîzoglu, Kevneparlamentera DEP'ê Leyla Zana, Şaredarê Bajarê Mezin Osman Baydemîr û bi sedan kes amade bûn. Şahiyê bi axaftina Remzî Azîzoglu dest pê kir. Azîzoglu, li ser girîngiya ziman rawestiya û xwest ku êdî her kes di her qada jiyanê de bi kurdî biaxive. Piştre aktîvîstê zimanê kurdî Hazan Yilmaz jî bi zazakî axaftinek kir û girîngiya ziman vegot.

**'Otoasîmîlasyon li ser ziman heye'**

Li pey axaftina vekirinê dengbêj Feleknaz stranên xwe ji beşdaran re pêşkêş kirin. Şaredarê Bajarê Mezin Osman Baydemîr jî axaftinek kir. Baydemîr anî ziman ku zimanê kurdî ha zazakî, ha kurmancî, ha goranî û ha jî soranî hemû yek e. Baydemîr, diyar kir ku li ser vê axê zimanê herî qedîm zimanê kurdî ye û wiha got: "Zimanê me bi dengbêjî û têkoşîna wêjevanê wekî Ehmedê Xanê, Celaled Bedirxan û Cegerxwîn hatiye parastin. Lê belê îro mixabin otoasîmîlasyonek li ser zimanê me heye. Ger ku em li ziman xwedî dernekevin tu kes li zimanê me xwedî dernakeve."

Piştî Baydemîr Leyla Zana jî axaftinek kir û xwest êdî siyasetmedarên kurd jî bi zimanê xwe biaxivin. Zana anî ziman ku gelê kurd bi têkoşîna xwe û biryara xwe zimanê xwe li hemberî hemû astengî û qedexeyan parastiye û divê vê yekê pêş bixe. Zana bal kişand ser kêmbûna girseyê û wiha got: "Yekem car e cejna ziman tê pîrozkirin. Ji ber vê yekê girse kêm be jî normal e. Gelê me li nirxên xwe xwedî derdikeve. Ez bawerim saleke din li vê qadê jî cihê mirovan dê namîne. Kemasî ne ya gel e, kêmasî ya siyaseta kurd e. Bê ziman tu milet nabe milet, ziman koka me ye. Ger ku mirov bi zimanê xwe biaxive dikare siyaseta xwe bimeşîne. Mirov dikare bijî. Em her tiştî ji bo ziman dixwazin. Ev mafê me ye. Lê belê divê berî her tiştî hemû siyasetdarên me di nava gelê xwe de bi zimanê kurdî biaxive û bike zimanê jiyanê." Zana xwest ku hemû kurd ji niha de xwe ji bo perwerdehiya ziman amade bikin û ji bo vê jî xebat, xebat û xebat lazim e.

Piştî axaftinan Koma KESK'ê ku girêdayî Konfederasyona KESK'ê ye û Hunermend Farqîn derketin ser dikê û girse bi stranên xwe coşandin. Şahî bi konsera Hunermend Farqîn bi dawî bû. **AMED / DÎHA**

# 'Rezaleta Min û Rozê'

**ADIL ZOZANÎ**

Demeke dirêj di nava nivîsîn nenivîsînê de çûm û hatim. Rexneya li ser berhemeke hunerê bê kirin divê di çarçoveya hin qaîdeyên wijdanî de be. Bi taybetî berhemeke sînemayê yan jî tiyatroyê dema mirov binirxîne û rexneyên xwe lê bîne, divê mirov bizanibe ku karekî kolektîf tê nirxandin.

Ji ber hindê hesasiyeta ji bo rexneyê pirtir derdikeve pêş. Ji bo galaya filmê 'Payîza Min û Rozê' ez jî hatibûm vexwendin. Di 1'ê Gulanê de ligel komeke rojnameger, hunermend û siyasetmedaran me ev film li Salona Sînemayê ya Burhan Karadenîz a Şaredariya Amedê temaşe kir.

Beriya ku film dest pê bike derhênera filmî Handan Ozturk bi çend hevokan heyecana xwe anîbû ziman û armanca xwe ya ji bo vî filmî vegotibû. 'Payîza Min û Rozê' (Benim ve Rozun Sohbaharı) qaşo ji bo ku balê bikişîne ser niqavkirina Heskîfê hatiye çêkirin. Hêmaya esasî ya derhênera filmê, beriya temaşekirinê ji me re gotî ev bû.

Rast e, film li Heskîfê hatiye kişandin. Serlehengê filmê Metîn rojnamegereke li hemberî çeteyeke rantê û dewletê ji bo ku Heskîf neyê niqavkirin têdikoşe. Di filmê de bûyerên li doranên vê çîrokê hatine honandin, hemaya esasî ya filmê têk biriye û film ji filmbûna Heskîfê dûr ketiye.

Di tevahiya filmê de bitenê carekê Şoreş ji bo ku rojnameya xwe bifiroşe turîstekî bi çend hevokan qala dîroka Heskîfê dike. Wekî din dîroka Heskîfê di vê filmê de nîn e. Mekan wekî fona filmê hatiye tercîhkirin. Lê, Ozturkê gotibû min filma wargehekî dîrokî kişandiye. Heke kêmasiya vê filmê bitenê evbûya, tiştek nedibû.

Mînak, Metîn rojnamegerekî îdealîst e. Dab û nêrîtên xwe yên pîşeyî heta dawiya filmê diparêze. Lê sahneya dawî, 'dide nîşandan' ku hemû hewldanên wî ji bo zêdekirina buhayê xwe bûne. Di sahneya dawî de çanteyê pere qebûl dike. Karektera Berfînê divê bi du awayan bê nirxandin. Yek; Berfîn gerîlayeke kevn e. Ji çiya hatiye û bûye xweşdiviya Metîn. Têkiliya wê û Metîn di çarçoveya objebûna zayendî de hatiye honandin. Du; ligel ku Berfîn gerîlayeke kevne, di nava civakê de çu statûyeke xwe nîn e. Li paş mêr hatiye rawestandin û jiyana wê sendirom e.

Karaktereke (Zekeriya) filmê heye ku dema min ew temaşe kir, dilê min lerizî. Çawa dibe ku şanogerekî kurd roleke wisa qebûl dike(!). Mînak di destpêka filmê de di nava nivînê de ye, heta dawiya filmê ji nava nivînê dernakeve. Jinika ku karaktera fahîşeyê lîstiye derdikeve digere û vedigere lê 'qirixê' wê tim di nava nivînan de ye.

'Payîza Min û Rozê' li Heskîfê hatiye kişandin. Heskîf wargehekî dîrokî yê Kurdistanê ye. Têkoşîna ji bo tê dayîn ji ber hindêye ku ev dîrok neyê windakirin. Derhênera filmê kurdeke ji Dêrsimê ye. Yekûyeko min hemû venekolan, lê bi qasî ez dizanim ji sedî 90'ê lîstîkvanên filmê kurd in û kurdî baş diaxivin. Piraniya wan cerebeyên wan ên ji bo sahneya kurdî hene. Lê balkêş e, di vê filmê de bitenê fahîşe û keça wê Roz bi kurdî diaxivin.

Ev tercîheke derhêner a bi zanebûn e. Lewre, di filmê de Tîjen û Metîn ji bo ku Roz lûgata tirkî baş bi kar bîne tim hişyariyan dikin. Tîjen, moderniteyê di çarçoveya rastlêvkirina tirkî de hînî Rozê dike.

Gelek tiştên din ên ku li ser vê filmê bêne gotin hene. Ji bilî performansa Xatûn û Rizayê Diholbaz divê ev film ji nû ve bê navkirin. Ev film 'Payîza Min û Rozê' nîn e. Encax dibe 'Rezaleta Min û Rozê'...

Ligel ku ev film ne filmê Heskîfê ye, di heman demê de heqeretê li nirxên kurdan jî dike. Niyeta lîstîkvan, derhêner ji bo min mijarê nîqaşê nîn in. Lê karê ku wan derxistiye holê ji hişmendiya rêzefilmên tirkan ne dûr e. Li dewsa ku kil bikin, kor kirine.

## Li Wêranşarê YDG-M'ê şahî li dar xist

Meclîsa Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (YDG-M) ya Wêranşarê li Navenda Çand û Hunerê ya Şaredariya Wêranşarê şahiyek li dar xist.

Endamên Meclîsa Ciwanên Demokratîk û Welatparêz a Wêranşarê li Salona Navenda Çand û Hunerê ya Şaredariya Wêranşarê şahiyek pêk anî. Di şahiyê de ligel Serokê Rêxistina DTP'ê yê navçeya Wêranşarê Adnan Etlî nêzî 600 kesî amade bûn. Şahiyê bi rêzgirtinê dest pê kir. Piştre endamê YDG-M'ê Faruk Ceylan, anî ziman ku li ser ciwanên kurd lîstikên qirêj têne lîstin û tê xwestin ciwanên kurd tevî asîmîlasyonê bikin.

**'Dixwazin mejiyê ciwanan bişon'**

Serokê Rêxistina DTP'ê yê Wêranşarê Adnan Etlî jî bal kişand ser hêza ciwanan û wiha got: "Ji ber ku ciwan çalak û afirîner in, ji ber ku ciwan pêşkêş û serkêşê civakê ne tê xwestin ku berî her tiştî ciwanan xirab bikin û asîmîle bikin.

Dixwazin feraseta 'Ez ne çepgir im û ne jî rastgir im. Ez gokvan im" derxin pêş. Dixwazin hiş û mejiyê ciwanan bi mijarên derveyî nasname û civakî tijî bikin. Me heta niha li dijî vê pergalê şerek meşand. Pergalê 17 hezar û 600 însanên me winda kirin. Li zindanan bi hezaran mirovên me girtî ne. Lê belê dîsa ciwanên me serî natewînin."

Piştî axaftinan skeça ku lîstikên li ser ciwanên kurdan tîne ziman hate pêşkêşkirin. Di şahiyê de dirûşmên wekî, "Bijî Serok Apo", "Ciwan fedaiyên Apo ne", "PKK gel e, gel li vir e" hatin berzkirin.

Şahiya ku ji ku aliyê Meclîsa Ciwanên Welatparêz û demokratîk hatibû organîzekirin bi konsera hunermendên herêmî bi dawî bû. **RIHA**

## Fîlmên kurd li Cannesê gelek xelat girtin

**I ALÎ GULER** CANNES - ANF

Derhênerê kurd Bahman Ghobadî filmê xwe yê bi navê 'Kes Behsa Pisîkên Îranê Nake' ve di 62'emîn Mîhrîcana Fîlman a Cannesê de 2 xelat bi hev re wergirtin. Fîlmê derhêner yê dawî di beşa mîhrîcanê ya "Un certain regard" de hat nîşandan û xelata juriyê ya taybet û xelata François Chalais bi hev re wergirtin.

Fîlmê Bahman Ghobadî di beşa mîhrîcanê ya 'Un certain regard' de hat nîşandan û 2 xelat wergirtin. Serokê Juriyê yê beşê derhênerê îtalyayî Paolo Sorrentino di merasîma xelatdayînê de axaftinek kir û anî ziman ku di mîhrîcanê de yek jê jî beşa herî girîng jî ev e û wiha got: "Îsal gelek fîlmên ji hev hêjatir hebûn. Berhemên hêja yên ji bo sînemayê." Piştî axaftinan navê kesên ku xelat girtine hatin diyarkirin. Di şevê de ji bo derhênerê kurd Bahman Ghobadî eleqeyeke taybet hebû. Ghobadî ji bo xelat spasdariyê xwe pêşkêşî juriyê kir.

Ghobadî piştî merasîmê der barê xelatê de wiha got: "Xeyala hemû kesî ye ku li Cannesê xelatê wergire. Lê ev xelat ji bo min ne xwedî wateyeke pir girîng e. Ji ber ku armanca min girtina xelatan nîn e. Ji ber wê şabim."

Her wiha fîlmê bi kurdî 'Pisepis Ligel Ba' yê Şehram Elîdî jî hêjayî 3 xelatan hate dîtin. Fîlm behsa jiyana zor û zehmet a li başûrê Kurdistanê dike.


## 'Girtîgeha Hejmara 5' li Amedê ye




Belgefîlma ji aliyê Çayan Demîrel ve hatiye kişandin ya bi navê 'Girtîgeha Hejmara 5'an' ku mijara wê girtîgeha Amedê ye piştî Mîhrîcana Fîlman ya Stenbolê li Amedê jî di çarçoveya Mîhrîcana Amedê de derket pêşberî temaşevan.

Di belgefîlma Çayan Demîrel de bûyerên Girtîgeha Amedê ya hejmara 5'an di darbeya 12'ê îlona 1980'î de heta 1984'an tê vegotin. Di vê navberê de li girtîgehê 34 kesan jiyana xwe ji dest da û bi sedan kes seqet man. Ji aliyê rayedarên leşkeriyê yên wê demê ev girtîgeh wekî 'dibistana leşkerî' dihat binavkirin. Her wiha girtiyan jî demên 1980-1984'an wekî 'dema wehşetê' bi nav dikin.

Heta niha girtîgeha Amedê ji aliyê gelek kesan ve bi awayên cuda hatiye vegotin û vê carê jî derhêner Çayan Demîrel bi kameraya xwe ve û gotûbêjan ve vê belgefîlmê vedibêje. Demîrel beriya vê bi navê '38' belgefîlma ku mijara wê serhildana Dêrsimê kişandibû. Belgefîlm dê piştî mîhrîcana Stenbolê îcar jî di çarçoveya Mîhrîcana Amedê de bê nîşandan. Fîlm 96 deqeyan dom dike. **AMED**




www.arsivakurd.org

# Bi 'Sê Rengan' êşa jinê

**Koma Şanoya Hêvî ku demekê navber dabû xebatên xwe, ji nû ve dest bi xebatê kir. Koma ku dest bi xebata lîstika 'Sê Reng' kir, di destpêkê de ji nîqaşa civakê derdikeve rê û pirsgirêka jinê û pirsgirêka 'Namûsê' hildide dest**



Koma Şanoya Hêvî ku di bin banê Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) ya Îzmîrê de xebatê dimeşîne, êş û pirsgirêkên jinê ya 'Namûs' bi lîstika 'Sê Reng' tîne ziman.

Koma Şanoya Hêvî ku demekê navber dabû xebatên xwe, ji nû ve dest bi xebatê kir. Koma ku dest bi xebata lîstika 'Sê Reng' kir, di destpêkê de ji nîqaşa civakê derdikeve rê û pirsgirêka jinê û pirsgirêka 'Namûsê' hildide dest. Lîstika bi navê 'Sê Reng' ku ev nêzî 3 meh e amadekariya wê tê kirin, ji 3 perdeyan û ji sê çîrokên kin pêk tê. Di beşa yekem de rengê spî 'Jina civaka paqij' tîne ziman. Di beşa duyem de rengê reş 'Şîn û tarîtiyê' tîne ziman. Di vê beşê de bêtir li ser aliyê civakê yê qirêj tê rawestandin. Jina ku hatiye qirêjkirin li ser rengê reş tê vegotin. Di beşa dawî de jî rengê sor ku 'Êrîşa li ser jinê û namûsê' tîne ziman tê vegotin. Di lîstika şanoyê de tê xwestin ku balê bikişîne ser rewşa jinê ya nav civakê.

**Dê li gelek bajaran bê nîşandan**

Derhênerê lîstikê Îlhan Çelîk, anî ziman ku ew dê di meha hezîranê de li Îzmîr, Amed, Dêrsim, Êlih û gelek bajarên din derkevin pêşberî temaşevanan. Çelîk, diyar kir ku ekîba wan ji 12 kesan pêk tê û wiha got: "Em bi vê lîstikê nakokiyê dixin mejiyê civakê. Bi vê lîstikê em êrîşa li ser jinê, pergala feodal û kesayetiya bi pergalê ve girêdayî ye li ber çavan radixin. Em van pirsgirêkan bi sedemên civakî û derûnî li pêş çavan radixin." Çelîk, anî ziman ku ew balê dikişînin ser êşa 30 salên dawî û encama vî şerî ku li ser çivakê pêk hatiye vedibêjin. Çelîk, destnîşan kir ku lîstika wan ji 3 rengan pêk tê û xwestine nakokiyên di nava civakê de bi van rengan vebêjin.

**Rengê sor…**

Çelîk, bal kişand ser wateya rengan û wiha got: "Reş şîn heznê tîne ziman. Sor jî êrîşa li ser jinê û li hemberî vê êrîşê serhildana jinê vedibêje. Her wiha bandora kapîtalîzmê ya li ser civakê û kes em tînin ziman. Di serî de rengê jinê spî ye. Piştî bandora kapîtalîzm û pergalê ev reng vediguhere rengê reş. Rengê sor jî jina ku di nava civakê de hatiye qirêjkirin û li hemberî vê yekê serhildana jinê em tînin ziman." **ÎZMÎR / DÎHA**

# Jinên kurd dê demokrasiyê nîqaş bikin

Çalakvanên mafên jinan, lêkolîner û siyasetvanên jin ji bo demokrasiya navbera jin û mêran nîqaş bikin, kom dibin. Ji bo vê yekê li bajarê Kolna Almanyayê dê 30'ê gulanê 'Konferansa Ji Bo Demokrasiya Navbera Jin û Mêran' bê lidarxistin. Di konferansê de ji çar parçeyên Kurdistanê û ji dîasporayê jinên kurd ên pispor wekî axêver beşdar dibin.

Konferans ji aliyê Navenda Lêkolînên Kurdî-Almanî (NAVEND) û Platforma Jinên Kurd roja şemiyê, li Kolnê li salona Internationales Zentrum Caritas tê birêvebirin. Di konferansê de dê pispor û çalakvanên mafên jinan, mijara demokrasiya navbera jin û mêran binirxînin.

Li gorî bernameyê dê berpirsa Navendê Bêrîvan Aymaz di vekirina konferansê de, der barê 'Rewşa Taybetî ya Jinên Kurd li Dîasporayê' gotarekê pêşkêş bike. Ji bakurê Kurdistanê çalakvana mafê jinan Gulmay Ertunç, ku li Wanê tevlî konferansê dibe, dê bi sernavê, 'Xebata Jinên Kurd li bakurê Kurdistanê: Stratejî, Hêz û Astengiyên Wan" semînerekê bide.

Li Cenevreya Swîsrê Malouk Caferi, dê der barê rewşa jinên kurd a li rojhilatê Kurdistanê raporekê pêşkêş bike. Li gorî bernama konferansê berpirsê Komela Alîkariyê WADI Arvid Vorman dê proje û kampanyayên WADI li başûrê Kurdistanê bîne ziman û der barê rewşa jinan de, dane û encamên xebata saziya xwe binirxîne.

Di rêza dawîn ya axaftinên konferansê de Sema Guçlu li Hamburga Almanyayê dê li ser pêwîstiya serxwebûna rêxistinên jinên kurd gotara xwe pêşkêş bike. Piştî konferansê wê êvarê panalek jî bê lidarxistin. Beşdarên panelê wê di nîqaşan de bersiva 'Gelo demokrasiya navbera jin û mêran tenê xeyal e?' bidin.

Di panelê de ji Îzmîrê Sevgî Alpsen Binbir, ji Munchenê Gulseren Demîrel, ji Dusseldorfê Cinur Ghaderi, ji Frankfurtê Parvaneh Ghorishi, ji Langenhagenê Ferha Khalil û ji Silêmanî Hatice Yaşar (Xecê) dê biaxivin. Konferans û panel dê ji alî Bêrîvan Aymaz û Jomana Cuma ve bêne birêvebirin. Ji rêxerên vê çalakiyê, Platforma Jinên Kurd di heman demê de wê salvegera platforma xwe jî pîroz bike. Çend însiyatîfên jinan ji sala 1984'an vir ve di bin navê Platforma Jinên Kurd de kom dibin. Komcivînên platformê her sal li bajarekî cuda yê Ewropayê tê lidarxistin.

Navenda Lêkolînên Kurd-Alman (Navend) jî di sala 1992'an li bajarê Bonnê hatiye damezirandin. Navend ji dema damezrandinê û vir ve bi taybetî li ser rewşa kurdên Almanya û entegrasyona wan ya li gel civaka alman gelek xebatên akademîk meşandiye. Navend ji du salan vir ve jî der barê jinên kurd de tevlî saziyên alman projeyekê dimeşîne. **BONN**

# 5'emîn mîhrîcana Zîlanê tê lidarxistin

Jinên kurd ên li Ewropayê dijîn dê 6'ê hezîranê Mîhrîcana Jinan a Zîlanê li dar bixin. Mîhrîcan dê li Gelsenkirchenê bê lidarxistin. Mîhrîcana Jinan a Zîlanê ji hêla Buroya Aştî ya Jinên Kurd (CENÎ) ve tê organîzekirin. 5'emîn Mîhrîcana Jinan a Zîlanê 3 sal in li Amfiteaterê pêk tê.

Di mîhrîcana îsal de bernameyên cuda hatin amadekirin. Der barê xebatên mîhrîcanê de nûnera Ceniyê Gulbahar Arslan agahî da. Arslan, destnîşan kir ku jinên kurd ên li Ewropayê dijîn ji axa xwe dûr in û gelek kurdan ji neçariyê berê xwe da xerîbiyê. Arslan, da zanîn ku li her derê Ewropayê jin dê tevlî mîhrîcanê bibin û dê ahenga renga derxin holê. Arslan, diyar kir ku her kes dikare tevli mîhrîcanê bibe û ji bo wan ziman, ol, reng û netew ne ev qas girîng e û wiha axaftina xwe dom kir: "Li dijî şer, êş, tecawiz, şîdet û tacizê bi hev re têbikoşin. Her wiha mîhrîcan îsal dê bi dirûşma 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' bê lidarxistin. Em daxwaz dikin ku bi mîhrîcanê vê kampanyayê pêş bixin. Dê bi xebat û hewldanên wisa nêrîna civakê ya der barê jinan de biguherînin û tabûya ku heyî ji holê rakin."

Arslan, daxuyand ku dê îsal bi bernameyeke dewlemend derkevin pêşberî jinên kurd. Arslan, di axaftina xwe de bal kişand ser bernameyê û diyar kir ku dê kon bê vekirin û panel bên lidarxistin, pêşangeha wêneyan a wênesazên jin ên kurd bên vekirin û defîle bên organîzekirin. **DUSSELDORF**



5"emîn Mîhrîcana Jinan a Zîlanê dê bi bernameyên dewlemend 6'ê hezîranê bê lidarxistin. Mîhrîcana îsal dê bi dirûşma 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' bê lidarxistin.




Suat Yuksekdogan (Zinar)
25-05-1992

**Bîranîn**

*Tu hêj 15 salî bû*
*Derketî serên çiyayan*
*Tu roniya diya xwe bû*
*Tu delalê welatê xwe bû*
*Ey heval Zinar!*
*Tu ji me dûr ketî*

*Tu bûyî rêhevalê Rojê*
*Tu ji gelê xwe re bû ronahî*
*Şehîdê me yê delal*
*Ev dil tu car te ji bîr nake*
*Xortê çeleng, roniya rojê…*

*Em, te û heft hevalên te bi bîr tînin û li ber şehadeta we bejna xwe ditewînin.*

**Li ser navê malbata wî**
**Jiyan Yuksekbag**


Derya KOÇGIRÎ

## Namûs!

Di derdora diyardeya namûsê de zîhniyeta sazbûyî ya riya pirsgirêkan vekiriye, di erdnîgariya me de jî pirsgirêkên bingehîn in û li hêviya afirandina çareseriyê ye. Her roj ji ber çavkaniyên têgihîna namûsê, çi qetlê ku pêk nayên, çi şîdetên ku nayên bikaranîn namîne.

Diyardeya namûsê, bi jina ku dibe milkê taybet pêşketiye. Di dema jiyana ku li derdora jinê hatibû pêşxistin û şerê wê yê giran û dirêj bi zilam re, bi her awayî jin radest tê girtin û di encama bi êş de, diyardeya namûsê ku derdikeve, bi hezaran salan jin bêhêz hiştin, wê ber bi derveyî jiyanê de dibe.

Jina ku aîdê civaka xwe ye, ji civaka xwe tê qutkirin û mehkûmî malên taybet dibe. Her ku ji civaka xwe tê qutkirin û jina ku dibe malê taybet, vegotina mafê zilam ê li ser jinê zêde dibe.

Zilam li hember jinê ji bo ku vî mafî bi dest bigire, rê û rêbazên gelek bi qurnazî bi kar tîne, ne tenê bedena jinê, di destpêkê de fikir û cîhana hestên jinê radest digire.

Jina ku ji cîhana hest û fikrê xwe, ji têgîna civaka xwe tê qutkirin, her ku diçe jiyana ji bo zilam, hebûna ji bo wî dibe wekî hestiyariyekê û heta di hestiyên jinê de jî bi cih dibe. Di pêvajoya têkoşîna tehakûma bi hezaran salan jin hîn zêdetir ji xwe dûr dikeve, dibe milkê taybet, ji bo vê pejirandinê xwe ji zilam dûr nexistiye.

Bi qasî ku ev pejirandin ne hêsan e, di dema vê nepejirandinê ku di hundirê xwe de nedaye rûniştin gelek caran derz jî derdikevin holê. Lêgerên wê yên azadiyê di van derizandina de her daîm hebûna xwe aşkere kiriye.

Di tevahiya erdnîgariya cîhanê de ev pêvajo bi şêweyên cuda hatine pêş û di nav gelek civakan jî, li ser bedena jin pergala ku hatiye afirandin têdikoşe de, asta ku jin karibe der heqê jiyana xwe de biryarê bide derxistiye holê.

Civakên di vê der barê de pêşketin her çiqas bi dest girtinên di asta têgînên zîhnî de, pirsgirêkên derbaskirinê hebin jî, bi pirsgirêkên erdnîgariya me re bên muqayesekirin asteke gelek pêşketî jî aşkere dikin.

Di vê lêgera azadiyê ya jina têkoşer de, jin ji aliyekî ve bi têkoşîna xwe ji warê namûsbûnê derdikeve, lê belê zilam di têgîhiştina "jin namûsa min e" de israr dike. Di şerê navbera van her du têkoşînan de bi hezaran salan sînorên gelek tûj çêbûne.

Di vî şerê bi qasî sînoran tûj, ku di zik hevdu de tê meşandin de, jina ku êşên mezin dijî, bi mehkûmiyeta diyardeya namûsê talûkeya gelek girîng di roja me ya îro de jî bi xwe re tîne.

Bêguman şêweya bi destgirtina namûsê, di civaka kurdan de bi têkoşîna azadiyê ve girêdayî dê zêdetir lê were pirsîn. Bi vê lêpirsînê, di diyardeya namûsê de veguhartinên girîng derketine.

Têgîna namûsê, hekîmiyeta li ser bedena jinê veguheriye têgîna berî rizgariya welat. Di rastiya Kurdistanê de guhartineke bi vî awayî di têkoşîna azadiya jinê de bingehê pêşketinên girîng derxistine holê.

Di rastiya Kurdistanê de veguhartina der barê vê diyardeyê de jin û namûs û bi taybet bi hevrebûna van têgînan, bi giştî hin ji holê nehatiye rakirin.

Çi heyf e ku wek di hemû xaknîgariya Rojhilata Navîn de di nav civaka kurdan de jî, vê diyardeya namûsê hîn bi jinê re wekhev dihesibînin.

Ji aliyekî ve bi destgirtina zîhnîyeta namûsê, bi vê şêweyê bi dest digire, veguhartin çêdibe, ji aliyê din ve têgihiştina wekhevbûna jin û namûsê dixwazin biparêzin.

Bingehê têkoşîna zayendî ya di navbera jin û zilam de famkirina têgîna namûsê di asta civakî de jî veguhartinekê pêş dixe. Ev jî, bi serê xwe têkoşîneke gelek çetin tîne. Her wiha têkoşîna bi tenê na divê bi rêxistinê têbikoşin.

www.arsivakurdi.org

Hawar
25 Gulan 2009 Duşem

## Masiyeke balkêş

Masiya ku li Behra Spî û Afrîkaya başûr dijî û ji ber ku li pişta wî xêzên rengê zêrîn hene wekî cureya sarpa salpa tê nasîn. Her wiha êdî ev masî li avên herêma bakur jî tê dîtin. Pisporan diyar kir ji ber sedema guhertina avhewayê masî derdikevin derveyî herêma xwe. Pisporan da zanîn ku ev cureyê masiyê li welatên behra spî tên dîtin û welatên din vê cureya masiyê nas nake. Serê vê masiyê nayê xwarin û bi talûke ye. Talûka xwarina serê vê masiyê mirovan nakuje lê mirov çend rojan di bin bandora halusînasyonê de dimînin.



# Dadgehê îstasyona bazê bi zirar dît

Ji bo ku îstasyonên bazê ji cih û waran bên derxistin, gelek welatî ketibûn nava hewldanên hiqûqî û her wiha dadgehê jî piştgirî dabû têkoşîna welatiyan. Welatiyan der barê vê mijarê de doz vekiribû û Dadgeha Hiqûqî ya Asliye ya Foçayê ev doz di cih de dît û bal kişand ser zirarên îstasyona bazê û gotin ku feydeyê ku ji xizmetê tên bidestxistin, têrî zirara wan neke û biryar dan ku îstasyonên bazê rabin.



*Berdevka 'Platforma ji Îstasyona Bazê re Êdî bes e' parêzer Yelda Kullap*

İstasyonên bazê elektro- manyetîkê belav dike û zirarê dide tenduristiya mirovan. Ji bo ku li derveyî cih û waran bê avakirin gelek biryarên dadgehê hene. Her wiha li van biryaran yeke din jî zêde bû. Biryareke din jî ji aliyê Dadgeha Esliye ya Foçayê ve der barê şîrketa GSM ya ku xebatên îstasyona bazê dike de hat dayîn.

Li taxa Fevzî Çakmak a Navçeya Foça Îzmîrê di 2008'an de şîrketa Avea baza îstasyonê ava kir. Welatiyên bi navê Selahattîn Tokta, Mustafa Yillikçi, Battal Kuşhan û Yucel Sumnulu der barê şîrketê de doz vekir. Di rojên borî de doz bi encam bû. Di encama dozê de hate destnîşankirin ku hate tespîtkirin ku radyasyona elektro-manyetîk zirareke mezin dide beden û rihê mirovan. Her wiha di encamê de hate diyarkirin ku ev xizmeta ku tê kirin ne nêzîkatiyek rast e. Dadgehê kesên ku doz vekirin, mafdar dît û biryar da ku ji dadgeha bilind jî biryara nîhayî bê dê faaliyetên îstasyonên bazê bidin sekinandin.

**Ji bo ku îstasyonên bazê ji cih û waran bên derxistin, welatî her tim di nava hewldanên hiqûqî de bûn û her wiha dadgehan jî piştgirî dabû têkoşîna wan. Dadgeha Hiqûqî ya Asliye ya Foçayê jî ev doza welatiyan di cih de dît**

### Dadgehê tenduristî tercîh kir

Berdevka Platforma ji Îstasyonên Bazê re Bêje Êdî Bes e, parêzer Yelda Kullap diyar kir ku ligel biryarên dadgehê hê jî şîrketên GSM'ê îstasyonan ava dikin û bi tenduristiya gel dilîzin. Kulap diyar kir ku dozên ku der barê vê mijarê de hatibûn vekirin, ji vana gelek hatin qezenckirin û wiha pê de çû: "Der barê vê mijarê de gelek doz hatin qezenckirin. Di biryaran de hate gotin ku di tenduristiya mirovan de rîsk hebe, divê di navbera teknolojî û tenduristiya mirovan de tercîhek bê kirin. Ji ber vê jî biryara dadgehan tercîha tenduristiya mirovan bû." Kulap anî ziman ku li Tirkiyeyê li dijî îstasyonên bazê têkoşîn tê dayîn. Kulap wiha dirêjî da axaftina xwe:

"Ev aloziya nava civakê divê ji holê rabe. Ev tenê pirsgirêka Îzmîrê nîn e. Em dinêrin ku li Qers, Erzirom, Bodrum û gelek derên din jî heye. Li her derê li dijî vê têkoşîn tê dayîn. Divê pêşî li vê yekê bê girtin. Ez tenê li 100 dozî dinêrim. Divê êdî ji bo vê çareseriyek pêk bê." **ÎZMÎR**



# Ev gund li ava paqij digere



Li navçeya Wêranşara Rihayê li gundê Demya Mezin, welatî bi hesreta ava paqij in. Li vî gundî welatî ji sarincan avê dikişînin. Gundî ji bo ku li gundê wan bîr bê vedan serî li rayedaran dan lê tu encam bi dest nexistin.

Li gundê Demya Mezin a Wêranşarê gundî hê jî di sarincan de avê vedixwin. Gundiyan diyar kir ku ev av ne baş e û tê de gelek kurmik hene. Gundiyan da zanîn ku ji ber ku mecbûr in vê avê vedixwin û her wiha avê di parzûn re derbas dikin. Jina bi navê Genduha Delîn (55) der barê vê mijarê de axivî û diyar kir ku di mehên havîn de hesretî vê avê ne jî.

Delîn wiha pê de çû: "Di destê me de tenê ev av heye. Em hemû pêwistiyên xwe bi vê avê dikin. Di nava avê de gelek kurmik hene lê em mecbûr in. Ji vir şûnde dê sarinc ziwa bibin. Wê demê em ji bajar bi tankêran avê dikirin. Ji ber ku gundê me hemû zinarên em nekarin bîran jî bikolin. Maliyeta wê jî gelek zêde ye.

### Nexweşî zêde dibin

Kurê Genduha Delîn, Mehmet Delîn (35) jî diyar kir ku di jiyana gundiyan de av parçeyeke gelekî girîng e. Delîn wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di jiyana gund de teqez divê av hebe. Sewalên me hene. Nebatên me hene. Ji bo vê me serî li gelek derî xist. Lê li gundê me bîrek jî çênekirin. Me hewl da ku em çêkin. Gund hemû zinar e û av di kûr de ye. Maliyeta wê zêde bû."

Doktorên ocaxa tenduristiyê jî diyar kirin ku gelek welatî ji ber vê sedemê pirsgirêkên tenduristiyê dijîn û bi taybetî gundî nexweşiya emel dijîn. **RIHA**

## facebook

# Li Îranê qedexe ye

Li Tirkiyeyê di serî youtube û gelek malperên înternetê hatibûn qedexekirin. Piştî Tirkiyeyê rejîma Îranê jî beriya hilbijartinên serokomariyê ku di meha hezîranê de pêk tê, malpera Facebookê asteng kir.

Li gorî nûçeya ajansa Îlha wiha tê gotin: "Malper hate qedexekirin. Çimkî alîgirê endamê serokomariyê Mîr Huseyîn Musawî ji bo ku pozîsyona xwe zêde bide nasîn, ji Facebookê feyde girtin." Di malpera Facebook a Mîr Huseyîn Musawî de 5200 kes qeyd kirîbûn. **TEHRAN**

# Ekolojîst Shiva tê Tirkiyeyê

Ekolojîsta navdar Vandana Shiva û avakara Tevgera Slow Food ku ji bo çanda fast food prostesto bike hatiye damezirandin Carlo Petrinî ji bo beşdarî Platforma ji GDO'yan re Na tên Stenbolê.

Platforma ji organîzmayên genetîka wan hatiye guhartin re (GDO) na û Slow Fooda Tirkiyeyê û Enstîtuya Zanyariya Hawirdorê ya Zanîngeha Bogazîçî bi hev re bi mijara "Pêşeroja Xurekan" sempozyûmekê dê li dar xin. Sempozyûm di nava 27-28'ê gulanê de li Navenda Çanda Zanîngeha Bogazîçiyê tê lidarxistin. Di sempozyûmê de ligel Vandana Shiva û Carlo Petrinî gelek kesên din jî dê nêrînên xwe bibêjin. Di sempozyûmê de her wiha xebatên atolyeyan yên der barê parastina curbicuriyên biyo, avakirina xeleka adil ku ji hilberîner heta mezêxer, parvekirina çavkaniyên avê hwd. bêne nîşandan. Fikrên hevpar ên di xebatên atolyeyan de derketine dê weke danezanekê bi raya giştî ya netewî û navnetewî re bên parvekirin. **STENBOL**



www.arsivakurdi.org